

Li Qamişloyê Kovara PIRSê Ahenga Çilrojîya nivîskar û rewşenbîrê Kurd Rezoyê Osê li dar xist

Bi beşdariya birek ji rewşenbîr, nivîskar, hezker û malbata nivîskarê hêja Rezoyê Osê, êvara pêncşembê 15/04/2010Z, bi xuleyê bê dengî li ser rewanê pak ê Rezo û rewanê hemî cangoriyên Kurd ahengê dest pê kir. Pêşkêşvanê wê weha got: Beşdarên hêja û bi rûmet...

Li destpêkê, bi navê Komîta birêvebir a Kovara PIRSê, em xêrhatina we dikin. Hêvî û omîda me ew e, ku di vê ahenga çilrojîya nivîskar û rewşenbîrê Kurd ê hêja, bira û hevkarê me Rezo yê Osê de, em bi hev re sinciyên wî yên bilind û mirovane, di bîra xwe de bînin, kar û xebata wî ya çil salî, di ber çand û zimanê Kurdî de ,bi rêz û rûmet binirxînin.

Ji ber rewşa ewlekarî ya taybet a vê heyamê, me nikarîbû hemî dost, heval, hogir û hezkerên kek Rezo di vê ahengê de beşdar bikin. Em lêborînê ji we û hemî rewşenbîrên Kurd ên derveyî vê civatê dixwazin, hêvîdar in hûn kêmasiyên me bibexşînin.

Xwişk û birayên rêzdar...

Li nik desteya Kovara PIRSê biryar e, di hejmara wê ya bê de, dosayeke fireh, yan hejmareke taybet li ser kek Rezo bête weşandin. Ji ber wilo jî, berhem, nivîs û lêkolînên ku li ser gorbuhuşt ji me re hatine, em ê wan di wê hejmarê de biweşînin. Herweha, emê derfetê ta dawîya vê mehê bidin nivîskar û hezkerên wî, kesê ku bixwaze li ser binivîse, ew dikare berhema xwe li ser navnîşana Kovarê bişîne. Berhemên ku ta niha gihane desteya Kovarê, ev in: 1-Lêkolîneke Rojnamevanî bi sernava (Rezo zindî ye) bi pênûsa nivîskar û endamê Komîta Kovara PIRSê yê berê birêz Dilovan hatiye nivîsandin. 2-Lêkolîneke zengîn û berfireh bi sernava (Rezo Osê, Kurdîzan, ronabîr û folklornas) bi pênûsa endamê Komîta Kovara PIRSê yê berê mamoste Berzo hatiye nivîsandin. 3-Helbestek ji helbestvan Arşek Baravî bi sernava **YADÎGARA ÇILÎNIYA MIHRE RIZO OSÊ**

giha şevê û hin malik jê hatin xwendin.

4-Helbestek bi sernava **Rêheval Rezo** bi pênûsa helbestvanê Kurd ê hêja Mihemed Elî Heso giha şevê û hin malik jê hatin xwendin.

5-Helbestek ji helbestvan Tengezarê Marînî bi sernava **Peyv di çavên min de man** giha şevê û hin malik jê hatin xwendin.

6- Helbestek ji helbestvan Melevan Resûl bi sernava **Çavê min dawerivîn** giha şevê, hin malik jê hatin xwendin.

7-Helbestek ji helbestvan Mehmûdê Badilî bi sernava **EM** giha şevê.

8-Helbestek ji helbestvan Fîxan Osê bi sernava **Hestê min giha** şevê.

9-Helbestek bi sernava **Keskesorek ji Degşûrî** ji helbestvan Abdusemed Mehmûd giha şevê.

10-Birûskek ji Serokê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê Zinar Soran giha şevê û hate xwendin.

11-Nameyêke ji Desteya birêvebir a çilrojîya Rezo li Hanover û endamên Kovara PIRSê yên berê Heyder Umer, Merwan Osman û Tengezarê Marînî giha şevê, hin movikên bijarte jê hatin xwendin.

12-Birûskek ji birêz Nazlî Xelîl (Diya Fuad) ji Stockholmê giha şevê û ew hate xwendin.

13-Birûskek ji Kovara AL-Hîwar giha şevê û ew hate xwendin.

14- helbestek bi sernava **bo Rezo Osê bi tena serê xwe** ji helbestvan **Arjen arî** ji Amed, ji Kurdistana bakur piştî şevê giha kovarê.

15-gotarek ji mamostê hêja Deham Ebdulfettah bi sernava **Tu çûyî! Lê, Tu ji bîr nabî heval ...!!** Piştî şevê giha kovarê.

Piştî vê xwendinê, ev gotarên li jêr hatin xwendin:

Gotina Kovara PIRSê. Gotina Kovarên Kurdî li Sûriyê. Gotina Mamostayê navdar Samiyê Mela Ehmedê Namî-Xezûrê gorbuhuşt Rezo. Gotina dost, heval û hogirên Rezo ji bal birêz Konê Reş ve hate xwendin. Gotina hevjîna Rezo, Nîgara Samiyê Namî hate xwendin Gotina Malbatê ji bal birêz Dr.Memo Abdî ve hate xwendin.